


## Bi laş guherînkarî nayê kirin

»»»» R:9

## Dualîbûna referanduma Komara Îslamî

»»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (445) 05-05-2023Buha (1000) Tûmen*

## Hilbijartina Turkiyê û dengê Kurdan

»»»» R:3

## Baskirin

»»»» R:6

# Kê li şoreşa Jîna yê de herwisa li ser piyane?



Piştî derbasbûna 7 mehan bi ser şoreşa seranserî li Îranê de bi dijî dîktatoriyê, ku ji Kurdistanê ve destpêkir û piştre bû şoreşeke seranserî li her cihekê welat, dirûşma xelkê seranserê welat bi awayeke yek deng, sernixûniya rejîma dîktatora Îslamî bû.

Vê yekîtiyê û yekdengiyê wisa kir ku bala hemî cîhanê bo aliyê xwe rakêşa û bû sedema piştgîriya civatgeha navnetewî û zaf welatan ji şoreşa xelkê Îranê, û gelek biryarên girîng û bibandor ji bona givaş xistina ser rejîmê û piştgîriya xelkê serhildayî hatin dan.

Kite xala çavnihêriya xelkê ser şeqaman û şoreşvan tenê mabû ji hêz û aliyên opozîsyona derveyî welat ku pilatform û hevbendiyekê di nava xwe de çêbikin bi 3 armancaan.

1 - Ev hevbendî û tifaq bikare bibe rêkxer û rêberê şoreşê.

2 - Ev hevbendî bikare bi nûneratiya dengê şoreşê piştevaniya navdewletî bo vê şoreşê û bi dijî rejîmê rabikêşe.

3 - Ev hevbendî û tifaq kar bike ji bona amade kirina bedîl û altirnatîva piştî sernixûniya rejîma dîktator.

Çavê xelkê serhildayî vê hindê bû ku ger opozîsyonê li pêxema hasilbûna wan armanc û hêvyên xelkê de pêngav havêtiba, bêguman xelkê şorişvan ên navxwe heya serkevtina yekcarî û sernixûniya dîktatoriyê nedisekinîn.

Li vê şoreşê de çi fîdakarî canliserdestî, nema ku xelk nekir, di rastiyê de wan rejîm anîbûn ser lêva kendalê sernixûniyê.

Niha pirsyar eva ye gelo kê bû sedemê sistbûna şoreşê û mana rejîma dîktator?

Herkes dizane ku opozîsyona seranserî tenê şerê gihîştina bi deshilatê dikin, parek ji wan ji rejîma hakim zêdetir nîgerane ku nebe rojekê li Îranê de azadî û wekhevî di navbera hemî cudahiyên netewî û olî û çandî de hebe, ev ji rejîmê tevahîxwaztirin û neyarê demokrasî û mafê netewan û sekolarîzmên e, û dilê wan bo yek ala û yek ziman û yek xak û yek ferhenga sepandî ya sed salan bi ser hemî netewên Îranê lêdide.

Lewma, bila herkes bizane sebebkarê sistiya şoreşê ne xelkê serhildayî bû, ne hêza tepeserker û xweragiriya rejîmê bû, ne netewên xeyrî fars bûn ku heya niha jî em dibînin her li Kurdistan û Belûçistanê li ser riyan in.

Sebebkarê dirêjkirina temenê rejîmê û paştexistina sernixûniya wê û sistiya şoreşê, tenê û tenê zorxwazî û nebûna bawerî bi azadî û demokrasiya dinav hêzên opozîsyona tevahîxwaz a seranserî bû, ku webala wan hemî xwîn û fîdakariyên xelkê serhildayî bistûyê wan e.

# Dualîbûna referanduma Komara Îslamî




## N: Mistefa Hicrî

Herî dawî Xamineyî di civîneke de ligel xwendekarên Besîc, di bersiva daxwazên hinek kesayetiyên siyasî yên rexnegirên rejîmê de ku daxwaza referandumê li ser mijarên herî girîng û hestiyar ên welat kiribûn, got: Çima ger hemû ev kesên ku dibe di referandumê de beşdar bibin şiyana şirovekirina vê pirsê hene? Gelo ev mesele çi ye?

Derbarê gotinên Xamineyî de, medyayên dewletê û hinek ji alîgirên wî pêka rêçka wî hewl dan bi şiroveyên zêdetir û rohnkirinên bi mebesta piştrastkirin an gotinan, xelkê asayî, li kûrahiya hikmet û heqîqeta van gotinan bidin fêmkirin! Ji bo mînak lêdvana Xulamelî Hedad di civîna "Şêwreya Hevalbendên Hêzên Şoreşa Îslamî de" ku her wî bixwe serkirdayetî dikir; Ev lêdvana zêdetir dişbiya bi lêdvanên alîgirên din yên Xamineyî ku bala van rabikêşe. Hedad Adil tevî vê ku ragihand referendum dibe sebeba "Fitnê" û îtraf bi vê yekê kir ku ev dibe sebeba aloztirbûna rewşê bo Komara Îslamî.

Bo rohnkirineke zêdetir a vê mijarê hewceye bibêjin di referandumê de, xelk deng bi siyaset û reftar û bigiştî deng bi mana vê rejîmê nadin û ev yeka jî li qamûsa Komara Îslamî de jêra tê gotin "fitine" û bi rastî " dibe sebeba aloztirbûna rewşê bo Komara Îslamî".

Eger wan (Welî Feqîh û koma desthilatdar) piştrast bûna ku dê gel dengê xwe bidin bi rejîmê û rejîm rewatiya xwe bi dest bixe, li gorî gotina Xumeynî "pîvan dengê gel e", renge niha li derheq bi encama referandumê ewqas serhişk nedibûn û nek her bi fitine bas ji wan dikir, belkî berevajî wan destpê dikir û dubare dikirin û bi pejrandina şiyana şiroveyên xelkê yên li derheq bi van pirsan dikevin piroseya referandumê. Heta wira dikarin bibêjin: Rejîm pêşvext li raman û dengê xelkê li derheq bi vê referandumê agehdare û dizane ku Komara Îslamî bê guman dorana sereke ya referandumê ye, ku xelk bi şêweya azadane û bi bê tirs li hêzên serkutker û encamên vê başdarî dikin. Lewma, rejîmê berevajî propagende û hera û hurayên medyayên hikûmetî û taqma alîgir, rejîmeke kes nexwaz û nefretlêkirî û piştire jî ji nav diçe.

Aliyeke din a vê mijarê eva ye ku, bi salan e xelk ji Komara Îslamî bêzar û bê hêvî bûye, çimkî di heyama wan salan de, hebûna hêviya çaksaziyê û vekirîbûna nav rejîmê di çarçoveya azadiyê de bûye mijareke bê binyat, bi hegera vê ku rejîm di bersivdan û baştirkirina rewşa jiyana xelkê û sedan daxwaziyên liser hev kombûyî yên rewayên din xemsar bûye û roj bi roj zêdetir givaş xistiye ser xelkê. Armanca tevgera "Jin, Jiyan, Azadî" ku nêzî 8 mehan berî niha û piştî kuştina "Jîna"yê ji aliyê hêzên "Geşta Îrşad" ve dest pê kiriye, li hundirê xwe de dirûşmên pêkhatişikên û herifîner li hemû cihên welat de bilind kirine û heta niha jî berdewam in, li pey derbasbûna tevaw ji Komara Îslamî bûye, tevgerek ku taybetmendiyên vê zêdetir wek referanduma "Ne bo Komara Îslamî" ye.

Lewma, di vê derheqê de baskirin ji referandum û xwe mijûlkirin bi vê mijarê bi tenê ji rêderxistina hizra giştî ji herifandinê bo encamdana refrandumê û bersiveke bê naverok bo daxwaziyên neteweyan li cografiyaya Îranê û hizra giştî ya cîhanê ye. Rohn e ku rejîm him dixwaze ji wan herduyan bo qazanca xwe mifahê jê verbigre, bi taybet ku îro bo hemû kesê rohn bûye ku ew referanduma ku bas jê tê kirin bi hebûna vê rejîmê li desthilatê de, bilî "kutana hesinê sar" ti tiştekê din nine û ti encamek jî tunabe.

Di vê qonaxa serhildana xelkê Îranê li dijî rejîmê û dîtingeha erênî ya civaka navneteweyî di piştevanîkirina daxwaziyên wan, dest û pêwendiyên medyayên hikûmetî bi berdewamî hewla vê yekê didin ku bala xelkê ji zemîneya rastiyan û daxwaziyên bingehîn ên xelkê ku di rastiyê de herifandina rejîmê ye, bi vê pirsa dûr, ji rê derxînin û wisa bidin xuya ku rexne rû li hejmareke berpirsan e, nek tevahiya rejîmê û renge radest jî bikin.

# Hilbijartina Turkiyê û dengê Kurdan



**N. Nûredîn Sofîzade**

Roja 14ê meha Gulanê hilbijartina ji bona nûnerên Parleman û herwisa Serok Komarê Tirkiyê bi rê ve diçe, gelek mêjveye ku ev yêka bûye mijara germ a nava medya yan û herwisa banghêj û metîng û pirûpagenda aliyên rikeber bona beşdarî di vê hilbijartinê de, da ku bikevne nava rikeberiyê de ji bona bi dest ve anîna dengê zêdetir û bidest ve girtina hêza pitir di nava dem û dezgehên birê ve beriya welatê Tirkiyê de.
Gorî hilsengandin û rapirsiyan egera hindê heye ku piştî derbasbûna pitir ji 20 salan, rikeberên Erdoxan bikarin şansê serkevtinê bi dest ve bînin û Tirkiyê ji sîstema bi rêveberiya kite kesî xelas bikin.
Recep Teyîb Erdoxan di gera 2 yem a deshilata xwe de, sîstema birêveberiya welat ji Serokwezîriyê ve guherî bi sîstema Serkomarî, ji bo vê armancê ku her bixwe hemî deshilatan bigre dest.
Niha ji bo piropagendaya hilbijartinê, rikeberên Erdoxan û partiya wî, basê vegerandina sîstema serokatiyê bo sîstema parlemanî dikin, bi taybetî Kemal Kilîçdar Oglu û partiya wî a bi navê CHP.
Ji bona serkevtina bi ser AKP ê de, gelek part û aliyên siyasî hevbendî çêkirine û hindî ji roja hilbijartinê nêzîk dibin, hind hêvîdar in ku ji serkevtinê nêzîk dibin.

Kemal Kilîçdar Oglu ku hevbendî di gel 5 hêz û aliyên din yên siyasî pêk aniye û navê vê hevbendiya xwe danane "Hevalbendiya Milet" gorî rapirsiyan di rikeberiya hember AKP ê û Erdoxan de li pêşe û şansê serkevtinê heye.
Kemal Kilîçdar Oglu ku rêberê Partiya Komarîxwaz a gel e û xwe rikeberê sereke yê Erdoxan û partiya wî dizane, ji milê bawera Olî de ji kêmaniya Elewî ye û ger ev bigehe deshilatê, guhartineke bê mînak li dîroka Turkiyê de tê kirin. Li ber vê yekê ku ola fermî li Tirkiyê de Îslama Sunne ye, gerç di yasaya bingehîna wî welatî de amaje bi Ola fermî nehatiye kirin.
Ev partiyên ku di gel Kilîçdar Oglu hevalbendiya "Milet" çêkirine, ku her hemî partiyên bi hêz û xwedî pêgehin ewin: Îyî Partî bi serokariya Merel Akşener, Partiya Îslamgeraya "Seadet" bi serokatiya Temel Karemla Oglu, "Gelecek Partî", bi serokatiya Ehmed Dawud Oglu, Partiya Demokrasî û pêşvero "DVA" bi serokatiya Elî Babacan, "Partiya Demokrat" bi serokatiya Gultekîn Awîsal. Hevalbendiya Milet pêk hatiye ji aliyên netewî, Çep, Îslamî, Lîbral, lewma şansê serkevtina vê gelek zêde ye.
Di vê navberê de gelo rewşa Kurdan û part û aliyên siyasî yên Kurd li Bakurê Kurdistanê çiye û bi çi mikanîzm û rêkarekê dixwazin biçin nava vê hilbijartinê?
Netewa Kurd li Bakûrê Kurdistanê û li welatê Tirkiyê de ger yek deng bin, bê guman dikarin ji hemî hêz û aliyeke din zêdetir serkevtinê bi dest ve bînin. Gorî texmîn û amarên ne fermî nifûsa Kurdan di wî welatî de pitir ji 25 Milyon kes e, lê mixabin heya niha bi çendîn sedeman Kurdan nekarîne yekdeng bin û bi awayê belav û netifaq mane.
Renge netifaqî û nebûna yek dengiyê tenê para Kurdên Bakûr nebe û mixabin li her çar perçên Kurdistanê gelê me ji dest nebûna tifaq û yekîtiyê dinalîne.

Yek ji Sedemên nebûna tifaqê di nava Kurdan de li Tirkiyê vedigere bo ser cehd û pîlanên deshilata wî welatî ku bi dirêjiya dîrokê înkara maf û hebûna Kurdan kiriye, pareke berçav ji Kurdan jî ku di bin siyaseta sîstema asmilasyona deshilatê de dixwînin û ji bona vê ku ji kar û pêşkevtin û beşdarî li deshilatê de pare nemînin, dikevne nava qopiya vê sîstemê û dibin parek ji deshilatê û mixabin bona berjewendiyên xwe, bi temamî pişta xwe didin gelê xwe, û înkara nasname û Kurdbûna xwe jî dikin.
Sedemeke din a nebûna tifaq û yekîtiya di navbera Kurdan di Tirkiyê de vedigere bo siyaseta partiyên mezin û deshilatdar di wî welatî de, gorî zaniyariyan tenê di nava AKP ê de ku Recep Teyîb Erdoxan serokê wê ye, û piraniya Parleman pêk hatiye ji kursiyên endam parlemanê yên partiya wî, pitir ji 70 endam parlemanên AKP ê Kurd in, an CHP ÎYÎ PARTÎ, SEADET, PARTIYA DAHATÎ, di heçî kîjan ji wan deshiladar û endamên Kurd hene ku mixabin herbxwe bûne parek ji înkara Kurd bûna xwe û tenê berjewendiya şexsî ya wan bo wan girîng e.
Sedemeke din ku mirov dikare bibêje derdê bê derman û ji hemiyan xeda tir, nebûna tifaq û yek dengiya Kurdan vedigere bo ser siyaset û kiryarên partiyên ku bi navê Kurdbûnê ve siyasetê dikin û bi temamî bûne sedemê netifaqî û yeknebûna Kurdan.
Partiya HDP ê ku partiya herî mezin û xwedî pêgehe li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de û her kes dizane ku girêdayî bi stratîjî û siyaseta PKK ê ye, heya hilbijartina sala 2014an karîbû deng û bala piraniya Kurdan bo aliyê xwe rabikêşe û pitir ji 80 kursiyên Parlemanê bidest ve bîne ku ev jî di dîrokê de bê mînak bû û weke serkevtineke mezin dihate hesibandin û HDP ê dikarî ji riya Parlemanê û hêza dengê xwe li deshilatê de bandor hebe û bi awayeke yasayî berevaniyê ji maf û nasname û hebûna Kurdan di wî welatî de bike, lê mixabin di kele kela coşa serkevtinê de, şerê Xendeqan kevte nava bajarên Kurdistanê.

Bi hegera şer ve hincetê kevte dest hikûmeta Tirkiyê ku vê serkevtinê bîne ser sifrê û betal bike ku mixabin zerermendê sereke Kurd bûn.
Bo hilbijartina vê carê HDPê hevalbendî di gel hin partiyên Çep û Sosyal û Demokrat ên Tirk pêk aniye, ku renge şertê van partiyên Tirk ji bo HDP ê ev be ku divê tenê bas ji demokratîze kirina Tirkiyê û çûna nava deshilatê bike, mixabin ya ku li hevalbendiya ÇEPA KESK de li heyama piropagenda hilbijartinê de xuya ye, çi bas ji Kurd û Kurdistan, mafê Kurd, ziman û nasnameya Kurd û çarenivîsa Kurd di wî welatî de çinîne.
Hinek Partiyên din ên Kurd hene ku siyaset û stratîjiya wan neteweye û armanca çareseriya mafê Kurd di Bakûrê Kurdistanê de ye. Mixabin li ber yek nebûna wan, herwisa hejmoniya berfireh a HDP ê û PKK ê, wan çend partiyên netewî nekarîne şert û mercên beşdarî li hilbijartinê de bi dest ve bînin û bandor hebin, hinek ji wan kevtine gel partiyên Çep ên Tirk, hinek li gel CHP ê hinek bê helwest û bê hêvî ne û çi stratîjiyek tunînin bo hilbijartinê.
Bê guman ger ev 5 an 6 partiyên netewî yên Kurd wek PAK, HAK PAR, PSK, PDK, TEVGER, li ser hinek mijarên hevpar bo mînak çawaniya çun û beşdariya di hilbijartinan de yek bana, dê aliyê kêm bikarîbana dengê alîgirên xwe komê ser hev bikin û dê bikarîbana bandor hebin û bibana cihê hêvya Kurdan, hingê bû ku egera pêşwazî û pesenda piraniya Kurdan bana û dengê wan devra xwe kom kiribana.
Di dawiyê de pirsa herî girîn eve ku erê gelo serkevtina heçî kîjan ji partiyên weke CHP û AKP ê û yên din, bo gelê Kurd çi fêde heye? Kîjan partî bas ji qedera Kurdan dike? Kîjan partî ger bigehe deshilatê, dê pirsa mafê Kurd çareser bike an bawerî pê heye?
Gelo ger nîva endamên parlemana Tirkiyê jî Kurd bin, dê bikarin mafê Kurdan û wekheviya di navbera Kurd û Tirkan de di yasaya wî welatî de biçespînin?
Ez bawer im heya Kurd û partiyên xwe nebin yek û hevxebat, heya stiratîjiya wan tenê nebe pirsa qedera Kurd, heya kurd bi ser partî û aliyê Tirk ên nasyonalîzm de parve bibin, rewşa Kurdan dê her ev be û deshilat û dewlet dê Kurdan bona serkevtin û berjewendiya xwe bikar bînin.
Lewra, Kurd li Tirkiyê de pitir ji 25 milyon kese, ger bikare bi yek dengî hilbijartinê baykot bike, dê bandor û dengvedaneke mezin hebe û dema ku hilbijartinê de Kurd serkevtinê bidest naîne, aliyê kêm baykot baştirîn serkevtine.

# Navdêrkirina rojan di cîhan û Îranê de



N: Bêhzad Qadirî

Armanca navdêrkirina rojan di cîhanê de

Armanc li navdêrkirina roj û hefteyên taybet di hemû welatên cîhanê de bilind ragirtina nirxan û qahîmkirina pêwendiyên olî, nîştimanî, kultûrî, zanistî, siyasî, aborî û civakî yên civakê ye, bi awayekê ku curek alîkarî û hevpêwendiya di navbera hev takên civakê de pêk bîne. Bo mînak di welatekê de rojek wek roja mamosta an roja xwendekar tê destnîşan kirin, vê yekê dikin hincetek da ku dive de rojê bi şêweyeke taybetîtir rêz li mamostayan an xwandekaran bê giritn û tevî rêzgirtin, hogirî jî dinavbera takên civakê de pêk bînin, bi curekê hemû vê rojê qebûl bikin û xwe bi parek ji vê sîstemên civakî û siyasî bizanin. Şêwaza destnîşankirina wan rojan jî di her welatekê de di welateke din de cuda ye. Bo mînak di Hindustanê de roja 5 Sêptamber wek roja mamosta hatiye dest nîşankirin, ev jî bi sebeba vê ku ev roja salroja jidaykbûna “Sarolî Rakirîşna”, Serkomarê duyem yê Hindê ye. Ev yeka nîşana vê ye ku armanca sîstema siyasî ya Hindê bo destnîşankirina vê rojê qahîmkirina pêwendiyên siyasî yên welat de. Hêjayê baskirinê ye ku di vê rojê de li Hindustanê, xwandekarên hilkeftî li xwandingehan de berpirsayetî û wane gotin bi polên asta xwatir digirin bi ştûyê xwe, û bi vî awayî rêz li mamostayên xwe digirin.

lewma di her welatekê de, desthilat dema ku bo her bûyer an mijarekê rojeke taybet diyarî dike, hejmarek faktên taybet û watedar li berçav digirin, da ku pêwendiyên dinavbera vê rojê de û navê de hebe, wate pêwendiyeke watedar hebûna vê hebê ye. Di vê barê de gelek caran navdêrkirina rojan mebesteke siyasî ya taybet pişt wan e; Bo mînka di welatekê de ku berjewendiyên nîştimanî li seray hemû berjewendiyan e, rêkevta jidayîkbûna kesayetiyeke mezin a nîştimanî ku cihê şanaziya tev civakê ye, wek roja mamosta destnîşan tê kirin; Lê, di welatekê de ku desthilateke dîktator birêve dibe, netenê salroja jidayîkbûna kesayrtiyeke nîştimanî ti girîngiyek pê nayê dan, renge salroja jidayîkbûna kesayetiyek siyasî yê ser bi detshilata dîktator ku di civakê de xwediyê ti pêgehekê nine, wek roja mamosta destnîşan dike. ,

Navdêrkirina roja di Îranê de

Herçawan ku min îşare pê kir, navdêrkirina rojan di her welatekê de, cuda ye. Ev mijara di Îranê de jî, bi heman awayî ye û heta gelek cudatir e, çimkû desthilat di Îranê de, bi destê taxmekê ye ku nûneratiya pareke gelek kêm a xelkê dike û ya ku ji bo wan li serweyî hemû mijar û pirsan e, mana sîstema wan e. lewma, di welateke mîna Îranê de hemû mijar û pirsên pêwendîdar bi desthilatê ve, bona man û xizmetkirin bi sîstemê temaşe lê dikin.

Li rojmêra Komara Îslamiya Îranê de, roja 12`ê Banemerê wek roja mamostayan hatiye destnîşankirin. Piştî şoreşa gelan di Îranê de, li sala 1357`an a Rojî de û piştî vê yekê ku taxma Xumenyî, dest bi ser şoreşê de girtin, rêkevta 12`ê Banemera 1358an, Murteza Muteherî ku ser bi taxma Xumeynî bû, ji aliyê girûpeke dijberên Komara Îslamî ve hat kuştin, û ev yeka bû ku ev roja, wate roja kuştina Muteherî bi armanceke siyasî û îdolojîk, weke roja mamosta di Îranê de hatiye diyarî kirin. Axûnd Murteza Muteherî, endamê heyeta mu`itelefeya Îslamî û di îdologên leşkerî yên Komara Îslamiya Îranê de




bû û piştî şoreşa 57`an bo bi serokê Şêwreya Înqlabê. Komara Îslamî roja jidaykbûna Hz. Elî wek roja bav û zilam li Îranê diyarî kiriye. Herwisa roja jidaykbûna Fatime Zehra, wek roja dayîk û jin li Îranê diyarî kiriye. Di wan her du mînakan de xuya dibe ku navdêrkrina wan rojan mebesteke siyasî û îdolojîk û olî li pişt vê heye.

Bi dirêjahiya hikûmeta Pehlewî û Komara Îslamî, bi hezaran kes ji neteweyên cuda kuştine, ev siyaseta ku ji serdema Riza Mîr Penc ve destpê kiriye, niha jî li koma formên din de heta di şêwayên radîkaltir de berdewam e.

Ev dîtingeha û ev cura siyaseta hertim di berjewerndiyên desthilatê de û bi mebesta parastina nizamê bûye, û hinek caran jî di berjewendiyên neteweya serdest (Fars) bûye. Bo mînak roja 25`ê Banemerê, li Îrrnê wek roja vebîranîna Ferdosî helbestvanê Fars hatiye diyarî kirin, lê li Îranê rojek bo vebîranîna mamosta Qani` helbestvanê Kurd netenê hebûna vê tuneye, belkû siyaseta Komara Îslamî hertim pişt guhxistina helbestvan, nivîskar û rewşenbîrên Kurd, kesên mîna maosta Qan`i bûye. Dema ku wisa ye neteweyên di nav çarçoveya Îranê de heta di navdêrkirina rojan di Îrnê de jî bi dûr hatine ragirtin û ev yeka di rastaya siyaseta êrîşa kultûriya desthilatê bo ser neteweyên xeyrî fars bûye.

Emê Kurdistanî li hember vê mijarê de

Niha ku cîhan cîhana dîcîtal û pêwendîgrtinane, piraniya takên civakê bi şêwazên cuda li torên civakî de, mifahê werdigrin û pêwendîgirtin bi cîhana xwazekî re roj li pey rojê zêdetir dibe. Di vê navberê de ez bas li qazanc û zirarên torên civakî nakim, belkû dixwazim îşare bi xaleke pir girîng bikim, ev jî “belavbûna lezgîn a data û zaniyariyan di torên civakî” de ye. Di vê pêwendiyê de, desthilatdar hertim bona berjewendiyên xwe û berfirehkirina îdolojiya xwe di torên civakî de mifah wergirtine.

Di vê barê de jî niha min bas kir, Komara Îslamî di torên civakî de, gelek kar encam dane. Saybiriyên rejîmê li pişt hejmareke rûpelên ecêb (ku ti carî kes bawer nake ku ser bi Komara Îslamî ne), mejûlî karkirin li ser vê mijarê ne. Bo mînak roja mamosta li Îranê (ku min bas kir çi rojeke û çi armancek li pişt de heye) zeq dikin ku nişkêve tê dîtin, di tevahiya torên civakî de belav bûye. “Çavlêkerî” jî yek ji amûrên alîkarîkirin bi vê hewla rejîmê ye: Ezê Kurd li yekek li wan rûpelan de pîrozbahiya roja mamosta dibînim û bi lez vê babetê berthem tînim, bo mînak roja mamosta li Îranê ye û vê yekê dikim bi hinceke ku pîrozbahiyê bibêjin bi mamostayê xwe!

Lê, roja mamosta li Îranê nikare roj be ku rêzgirtin li mamostayeke Kurd li Rojhilatê Kurdistanê be, çimkî rojeke hikûmî ye (hikûmetek ku di Kurdistanê de dagîrker e) û tenê nûneratiya taximeke civakê dike. Lê, hejmarek Kurd di bin bandora torên civakî û

Dom R:7

Dom R:7

bi sedema çavlêkeriyê bi bê hindê ku şirovek bo vê mijarê û siyaseta pişt vê mijarê hebin, bi vê yekê agehdar bin, dibe amûrek bo berfehbûna zêde a vê îdolojî û siyasetê ku rejîmê darêtiye.
Raste ku em wek Kurd xwediyê tu kiyaneke xwe nin, dewletek an hikûmetek nîve serbixwe jî me tuneye, ev mînaka ku min bas jê kir, (navdêrkirina rojan) bi desthilatê tê kirin da ku berfireh be, herwisa hewcehî bi rojreke wiha hene da ku bo mînak rêz li mamostayên xwe bigirin, lê eger me ti rojek jî nebe nabe bikevin bazineya vê siyasetê ku dagîrker bo me darêtiye. Çima dibe di roja jidayîkbpna Murteza Muteherî ku îdologekî Komara Îslamî bû (rejîmek ku dagirkerê av û axa me ye) pîrozbahî ji mamostyekî Kurd bikin û nasname û cîhanbîniya wî digel Murteza Mutehrî ji erdê heta esman cuda ye?!

Lê, li hember de partiyên Kurdistanî jî di vê barê de hinek kar kirine (herçiqas giştgîtir û fermî nin, lê, her başin û dikarin bingehek bin bo paşerojê ku hikûmeteke Kurdî pêk bê), bo mînak 12`ê Banemerê ji aliyê Yekîtiya Xwandekarên Demokrat ên Kurdistanê ve, wek roja xwandekartên Kurd hatiye diyarîkirin ku hember digel salroja şehîdkirina Îsmaîl Şerîfzade ye.
(Herçend ku bi hizra min baştir wisa bû ku rja jidayîkbûna îslamî Şerîfzade wek roja xwadekar bê diyarî kirin ne roja şehîdbûna wî)

Û ev yeka bi serstî dikare sînûr dinavbera me û wan de dabinên, dikare îşareyek be bo vê ku em jî bibêjim ku em jî hene, ya ku hûn bas jê dikin, bi tenê nûneratiya ve xwe dikin, lê em xwediyê nasnameyeke cuda ne. Ev yeka bixwe rawestan li hember siyasetên koloniyalîstiyên Komara Îslamî ye. Mînakek din: Bila di roja jidayîkbûpna Ferzad Kemanger de pîrozbahiya roja mamostayan li mamostayên Kurd bikin (gelek kes roja bidarvekirina Ferzad Kemanger bi roja mamostayên Kurd binav dikin, bi hizra min baştir evaye ku ev roja bo roja jidayîkbûna wî bê guherîn.

Encam
Wek takek Kurd, divê her dem em hişyar bin, bo mînak di mijareke wek ya han ku min bas kir renge asayî bê dîtin, lê asayî nine û gelek girîng e û dibe hişyar bin. Bi hizra min hemû mijarek bo me yê Kurdistanî di vê rewşa siyasî de divê gelek hûrbîn bin, dagîrkerê Kurdistanê ji hemû warekê ve pêka siyaset û îdolojiya xwe digel me reftarê dikin û eger em di wan waran de zanyarî û şirevekirina me nebe, otomatîk dibin amûrek bo berfrehkirina wan siyasetên ku bo heladina me û dijayetiya digel me û nasnameya me hatiye darêtin.

# Semînarek bi hilkefta 12ê Banemerê, roja Xwendekarê Kurd hate lidarxistin

Roja Sêşemî 12ê Banemera 1402 a Rojî, semînarek bi hilkefta 12ê Banemerê, roja "Xwendekarê Kurd" û herwisa bi bilindragirtina yada şehîd "Simayîl Şerîfzade" ji aliyê "Yekîtiya Xwendekarên Demokrat a Kurdistanê" ve hate lidarxistin.

Di destpêka wê semînarê de, "Mensûr Pîrotî", peyama "Yekîtiya Xwendekarên Demokrat a Kurdistanê" xwend.

Di panêla yekem de Endamê Rêberiya Hizba Demokrat "Kerîm Perwîzî", gotarek li jêr navê "Tevgera Xwendekarî Di Meşa Şoreşa Jîna"yê de pêşkêş kir.

"Kerîm Perwîzî" di beşek ji axavtinên xwe de got: "Qehremanên Kurd û Kurdistanê bi helwîst û kiryarên xwe di demên hestiyar de, hezaran hemase afirandine, heyrîmana xelkê biyayî bi qasekê ye ku wek mînak di şoreşa "Jîna"yê de Kurdistan bû pêşengê hemû neteweyên Îranê û heta li bajarên Farsnişîn de jî ku 40 sal berî niha bi hezaran kes ji wan bi fermana cehad bo êrîşkirin ser Kurdistanê dihatin, lê di şoreşa "Jîna"yê de li ser şeqaman hawar dikirin ku hivî dikin xwediyê helwîst û kiryarên Kurdistanê bin.

Piştre Endamê Birêveberiya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat a Kurdistanê, "Nasir Fethî" basek li ser "rol û erk"a xwendekar di vê serdemê de pêşkêş kir.




Piştre di vê semînarê de xelata "Simayîl Şerîfzade" pêşkêşê rewşenbîr û nivîskarê Kurd, xwedêjêrazî Dr. "Celal Hacîzad" ê naskirî bi "Raman" hate kirin.

Piştre bi endama "Yekîtiya Xwendekarên Demokrat a Kurdistanê", "Hêşû Xizrî" re ku di beşa "Kargêriya Yasa"yê li zanîngeha "Polîteknîk"a bajarê Hewlêrê de pileya yekem bi dest xistibû, lewheya rêzgirtinê hate pêşkêşkirin.

# Bi hilkefta roja jidayîkbûna Pêşewa "Qazî Mihemed" li bajarên Kurdistanê, çalakiyên banghêjî bi rê ve çûn

Endam û alîgirên Hizba Demokrat, salvegera jidayîkbûna yekem Serkomarê Kurdistanê û avakerê Hizba Demokrat Pêşewa "Qazî Mihemed", li bajarên "Mihabad, Merîwan û Bokan"ê bilind ragirtin.

Roja Duşemî 11ê Banemera 1402 a Rojî, endamên têkoşer ên Hizba Demokrat li bajarên "Mihabad, Merîwan û Bokan"ê, bi hilkefta roja jidayîkbûna yekemîn Serkomarê Kurdistanê Pêşewa"Qazî Mihemed", çalakiyên berfireh ên banghêjiyê lidar xistin.
Endamên Hizba Demokrat li gundê "Îsakend" û sêrêya "Seholan" a bajarê Mihabadê, bi bilindkirina alaya pîroz a Kurdistanê û belavkirina wêneyên Pêşewa "Qazî Mihemed", çalakiyek banghêjî lidar xistin.
Herwisa li bajarê Merîwanê, endamên Hizba Demokrat bi bilindkirina alaya Kurdistanê û belavkirina logoya Hizba Demokrat û wêneyên Pêşewa "Qazî Mihemed", yada Serkomarê Kurdistanê bilind ragirtin.

Herwisa li bajarê Bokanê jî, li "Koşka Zara" û hemberê gundê "Paşbilax"ê, endamên Hizba Demokrat bi bilindkirina alaya Kurdistanê û belavkirina peyamekê, yada jidayîkbûna Pêşewayê Kurdan bilind ragirtin û soza emegnasiya xwe digel hemû şehîdên Kurdistanê dûbare kirin.

# Baskirin



N: Kerîm Perwîzî

Neteweya Cihû, tevî vê ku bi dirêjahiya dîrokê azarekê zêde dîtine û bi sedan carî hatine malwêrankirin û derbiderkirin û li hember cîhanê de bo aliyê din derxistine û avarekirine û heta komkujî û jînosayt a mirovahiyê li dijî wan birê ve çûye. Lê, yek neteweya herî kêm ya cîhanê ne ku bandora wan li ser hizr û raman û têgihîştina mirovên cîhanê daniye û hinek nivîs û serpêhatiyên gelek kevin yên neteweya Cihûyan niha jî di nav piraniya neteweyên cuda di cîhanê de tê gotin û bawerî pê hene.

Her çend ku neteweyên din weke Someriyan çîroka Gilgamêş hene an neteweya Kurd di serdema Mîtramîsim de çîroka Mîtrayê hebû ku di cîhanê de bilav bûye û hinek devsên van curên hizrkirinê di hinek cihên cîhan û di netewe û olên cuda de, niha jî tên dîtin, lê ti neteweyek bi qasî neteweya Cihûyan çîrokên vê belav nebûne û ne bo netewe û neteweyên din nekevtin bin bandora rewatî û çîrok û dîroknas û cîhanbîniyan.

“Efsar” an rûpelên Tewrat û pirtûkên kevin yên Cihûyan pirin li çîrok û baskirinên cuda ku bas li kesayetiyan dike û reftarên wan kesayetiyan bûne hêma û sembol ku nasnameya bawermend û heta bi başbûna mirovan pê tê destnîşankirin.


Bilî hemû sebeb û sebeban ku ev diyardeyên han lê kevtine, yekek li girîngirtîn sebeban pêk tên ji vê ku neteweya Cihûyan pena xwe birine bo nivîsînê. Pirtûk û nivîsên hezaran salî hene, ku çîrok, hêma û hizirên kevtin di baskirinên destpêkî yên xwe de tomarkirine, nek tomarkirineke asayî, belkû kirine erk bo parek bijarde di civaka xwe de ku berdewam û rojane wan dixwînin û bi dehan gotinan bo xelkê.

Di rastiyê de tomarkirina hizrkirina wan û xwandina rojane ya wan û gitona wan a berdewam, nifşê li pey nifşê hem bo neteweya xwe parastiye û hem di nav neteweyên din de jî belav kirine û bi piranî di cîhanê de dikarî devsên wan çîrok û baskirinên Cihûyan di nav kultûr û efsaneyên neteweyên din de bibînin.

55 salan beriya niha li roja 12`ê Banemera sala 1347 a Rojî de, li Darvêneya ser bi bajarê Bane desteyeke pêşmergeyên can gorî digel Îsmaîl Şerîfzade, endamê rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, û li kesên têgiheştî û zana yê rêza xebatê di şereke ne banber û nemirovane de rû bi rû bûn, û piştî derbasbûna çendîn demjmêran berxwedaneke dijwar Îsmaîl Şerîfzade û hevalên wî bi destên hêzên dagîrker şehîd bûn. Şehîd Îsmaîl Şerîfzade di malbateke asayî de li bajarê Mihabadê jidayîk bibû, lê mîna kesekî neasayî mezin bibû, di zanîngehê de zêdetir li berê hizrkirnên wî neasayî bûn, çimkî li dijî asayîkirina stemkirina asayî ya paşyetiyê bû; Ev sîstema stemkar a zal di welat de, hem xelk tepeser dikir û hem Kurdistan jî wek koloniyekê bera xwe didayê, talan dikir.

Îsmaîl Şerîfzade, nedixwast bawerî bi çîrokên derev yên sîstema paşayetiyê bike, ku dixwast stemkariyên xwe asayî nîşan bide û mirin û jînav çûna rojane asayî bike. Lewma, bo bi serqafileya dirandina tarîtiyê.

Di zanîngehê de çû nav çeperên berxwedan û serhildanê de, û bû bi pêşmerge û bû bi endamê rêberiya Hizbek



ku bi destê Pêşewayê nemir hatibû avakirin.

Di dijwartirîn demên dîrokê de şehîd Îsmaîl Şerîfizade, seha vê yekê dikir ku karwana xebatê hêdî hêdî ji rê der dikeve û bi bê kiriyara karwan, xelkê çavnhêr û hêvîdar, bêhêvî dike, her ji ber vê yekê di nameyekê de bo Dr. Qasimlo dinivîse ku nîştiman hewcehî bi xortên têgihîştî û pêgihîştiye û dem dema kiryarê ye.

Lewma, digel komîteya şoreger a rêberiya Hizba Demokrat kevt, di ser de jî binavdeng û nemirên din yên weke mela Avare û Sulêman Mo`inî, tarîtiya sepandî li ser Kurdistanê de, bi hizra wan stemkariyek qebûl nekirî bû. Û bi helwesta mirovane ya xwe ev tarîtî dirandin.

Şehîd Îsmaîl Şerîfzade, li Darvêneya Baneyê de rastî bosyeya dujmin hat û dest û pêwendiyên îxanetkaran û piştî berxwedanyeke qehremanane û bê mînak ku bi dirêjahiya rojê berdewamkir tevlî karwana nemirên demokrat û cangoriyên rêya azadiya nîştiman bûn.

Renge çîrokên gelek qehreman yên neteweyên din weke Çêgvara di Amerîkaya Latîn an Garîbaldî li Îtaliya an çîrokên Tevratê bixwînin û jîrî, camêrî, mêrxasî û helwestên bilind ên wan kesan di mejiyê me de bandorê danê, lê kiryar helwesta weke Mela Avare û Îsmaîl Şerîfizade û bi dehan qehremanên neteweya me hinek ji wan ku bixweşî zindî ne, weke Mela Hesen Şêweselî; Ji wan çîrokên binavûdeng û kêm mînak in ku hem ti kêmasiyeke wan li hember qehremanên neteweyên din de tuneye, hem deqe bi deqe, afrînerên dîroka neteweyekê ne, ku komkirina wan li ser hev, îrade nasnameya neteweya wan pê dirust dibe ku bo sedan salan bi qahimî bimîne. Qeremanên Kurd û Kurdistanê bi helwesta kiriyar di demên hestyar de, bi hezaran hemase afirandin e û her kiryarek wan dîroke û çîrokek mezina mirovî ne ku ji me ra dibêjin mirovê Kurd di vê cîhanê de, çi kesayetiyek heye û ev nîştimana xwediyê çi bestineke kultûrî û hizriye, ku ev hemasane bi hezaran carî dubare dibin û temaşeçiyên biyanî tûşî ecêgitiryê dikin.

Ecêbgirtiyeke xelkê biyanî bi astekê ye ku bo mînak di şoreşa Jînayê de Kurdistan dibe pêşenga hemû neteweyên Îranê û heta di bajarên Fars rûniştî de jî ku 40 salan beriya niha bi hezaran kes ji wan bi fermana cîhadê bo êrîşkirina bo ser Kurdistanê dihatin, lê di şoreşa Jînayê de li ser şeqaman diqîriyan ku ev hêvîxwazin xwediyê helwest û kriyarên Kurdistanî bin!

Baskirina çîroka qeremantî û şêwaza hizrikirin û mirovbûna taken xwedî helwest, têgihîştî û pêgihîştiyên Kurd, tenê baskirineke sade nine, belkû hewcehiyeke neteweyî ye ku bikarin dîtingeh û dûrbîniya me dubare kom bikin û tomar bikin û nifiş li pey nifişê jiyan bi vî awayî ku em bixwe dibînin dîtingeheke kêm mînaka ciwannasiyê û herwisa jiyana azad û bi helwest dubare pênase bikin û tomar bikin û ji hemû xelkên din re bibêjin.

Jiyan cem şehîd Îslmaîl Şerîfizade û hemû şehîdên Kurdistanê bi pêşwaziya mirinê çûn nebû, belkû îradeyek bû bo dirandina tarîtiyê û ser neçemandin li hember stemkariyê de bû.

## Nerîna Lîderan



**"Kemal Kiliçdaroglu:"**

Ez ti car di welatê xwe de leşkerên biyanî naxwazim



**"Jeannine Plaschardt":**

Tirkiye jîngeha Îraqê wêran kiriye



**"Îlham Elî Of :"**

Pêşbînkirina paşeroja peywendiyên Îran û Azerbaycanê gelek aloz e



**"Nesîr |Husên":**

pêşî ji bikaranîna sembola şêr li ser goran bigirin

# Sala 2023an Tirkiye û Azerbaycan dev ji dagirkariya Ermenistanê bernadin!



**N: Eskender Ceiferî**

Ev zêdetirî salekê ye ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê.

Niha jî, ji destpêka 2023'an ve ji bilî Artsaxê, ew dixwazin dest danîn ser hin navçeyên din jî.

, Artsax, Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû.

Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan têk bir.
Komara Nagorno Qerebaxê yan jî Artsax li başûrê rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenistanê re hevsînor e.

Ji danezanîna serxwebûna di 1991'an vir ve, zimanê fermî yê Qerabaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek pişta Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi eşkere pişta Ermeniyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermeniyan li wir tev nagere.

Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermeniyan û hemû wan pêkhateyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî eşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenistanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenistanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenitsan li pişta wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenitsanê ku sala 2011'an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenistan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermeniyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermeniyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azeriyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî piranî Ermenî ne.
Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguhestin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.

DYA hweisa Tirkiye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbeycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Beriya niha jî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehandibû, heta niha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbeycanê geheştiye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkiyê ve bên şandin.

Di şerê Azerbeycan û Ermenistanê de bi dehan çekdarên Şûrî yên ku Tirkiyê ew şandine şerê Ermenistanê, hatin kuştin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.

Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin. Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbeycanê dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevlî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, heta niha Tikriyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenistanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku pişt rast bibin ku Tirkiye destê xwe nexe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagrono – Qarabaxê.


Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenistanê ve di wî çaxî de hat ku şer di navbera Ermenistanê û Azerbycanê da derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.

Balyozê Ermenistanê li Moskowayê Fardan Taganyan jî daye zanîn ku Tirkiye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenistanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenistanê şandine.

Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkiye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenistanê de bikarbîne.

Îranê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê parastî bin.

# Serkirdeyekî El Qaîdeyê li Sûriyê hat kuştin




Fermandariya Navendî ya Amerîkayê eşkere kir, di êrîşeke serbazî de li bakurê rojavayê Sûriyê, serkirdeyekî bilind ê El Qaîdeyê hat kuştin.

Fermandariya Navendî ya Amerîkayê eşkere kir, di êrîşeke serbazî de li bakurê rojavayê Sûriyê, serkirdeyekî bilind ê El Qaîdeyê hat kuştin.

Îro Çarşemê 3ê Gulana 2023an, Fermandariya Navendî ya Amerîkayê di daxuyaniyekê de armanckirina serkirdeyekî El Qaîdeyê li bakurê rojavayê Sûriyê ragihand û eşkere kir ku piştre dê zanyariyên zêdetir derbarê operasyonê de werin belavkirin.

Fermandarê Fermandariya Hêzên Navendî ya Amerîkayê General Michael Kurilla li ser vê mijarê ragihand: “Operasyon di çarçoveya bidawîanîna hejmûna DAIŞ û çekdarên El Qaîdey de bûye.”

# Washington:Pêwendî bi rêjîma Esed re nayê asayîkirin



Wezareta Derve ya Amerîka pêşwazî li şandeke Desteya Danûstandkar a Opozîsyonê Sûriyê kir û tekezî li ser wê yekê kir ku siyasta Amerîka derbarê Sûriyê de nehatiye guhartin û ew li dijî asayîkirina pêwendiyan bi rêjîma Beşar Esed re ne.

Beşa Karûbarên Rojhilata Nêzîk di Wezareta Derve ya Amerîka de îro 26ê Nîsana 2023an li hejmara xwe ya tora civakî “Twitter” belav kir, Cîgira Wezîrê Derve ya Amerîka Barbara Leaf pêşwazî li şandeke Desteya Danûstandkar a opozîsyona Sûriyê kir.

Diyar kir jî, aliyê Amerîkî di civînê de tekezî li ser wê yekê kiriye, siyaseta wê derbarê Sûriyê de nehatiye guhartin, ji ber nebûna guhertinên siyasî yên herdemî û piştgiriyek bihêz ji biryara Encûmena Asayişa Navdewletî 2254 re di nav de jî rola opozîsyona Sûriyê, ti pêwendî bi rêjîma Esed re nayê asayîkirin.

Şanda Desteya Danûstandkar duhî sêşemê 25ê Nîsanê bi serokatiya Serokê Desteya Danûstandkar Bedir Camûs endametiya Serokê Hevpeymaniya Opozîyonê Salim El-Muslet, nûnera serbixwe Fedwa El-Icêlî û Nûnerê ENKSê di opozîsyona Sûriyê de Îbrahîm Biro gihîştibû Washingtonê.

Ji aliyê xwe ve, Bedir Camûs piştî hevdîtina bi Barbara Leaf re diyar kir, wan di civînê de tekez kir li ser wê yekê kirin ku her çareseriyeke siyasî li Sûriyê, divê li gor biryarên Encûmena Ewlekariyê be, nemaze biryara 2254, her wiha nebûna çareseriya siyasî û cibicînekirina qonaxa veguhêz, dê trajediya gelê Sûriyê zêdetir bike.

# Li Idlibê dijî asayîkirina peywendiyên ligel hikûmeta Sûriyê xwepêşandan hat kirin

Li parêzgeha Idlibê li bakurê rojavayê Sûriyê ku wek navenda opozisyona Sûriyê tê naskirin, bi hezaran kes li dijî asayîkirina peywendiyên welatên Erebî ligel hikûmeta Beşar Esed xwepêşandan kirin.

Xwepêşander bi dirûşmên dijwar nerazîbûna xwe anîn ziman. Di xwepêşandanan de, dirûşmên wek Em dê bimirin, lê bi rejîma Esed re li hev nakin an jî Rejîma ku bi rejîma Esed re peywendiyan asayî bike, dê Esed qezenc bike û gelê Sûrî ji dest bide hatin bilindkirin.

Fehed Ebdulkerîm yek ji xwepêşanderên li Idlibê dibêje: “Em îro hatine daku beşdarî xwepêşandanê bibin. Ev xwepêşandan rastiya dilê xelkê nîşan dide. Xelk dijî asayîkirina li gel Esed in. Em her welatekî Erebî û Misilman ku peywendiyan ligel wî kesê Îslam û Misilman û şoreş û şoreşgêrên Sûriyê bi hinceta terorê dikuje şermezar dikin. Ew destê xwe didin mezintirîn tawanbar û terorîst li cîhanê.”

Piştî erdheja 6ê Sibata 2023an, piraniya welatên Erebî peywendiyên xwe ligel hikûmeta Sûriyê asayî kirin ku ji ber şerê navxwe yê wî welatî peywendiyên xwe bi Şamê re qut kiribûn, di nav wan de Misir û Erebistana Siûdiyê jî hene ku mezintirîn welatên Erebî ne.

Xwepêşandereke bi navê Huzeyfe el-Himmûd jî dibêje: “Tişta Siûdiye dike bo hemû neteweya Erebî serşorî ye. Tişta dikin ne rast e. Hemû dizanin ev rejîm tawanbar e, dixwazin em wê



qebûl bikin. Ev yek ji wan ne hatiye xwestin, ev karê me ye. Em şoreşgêrên Sûriyê biryarê li ser didin. Em biryarê didin gelo lihevkirinê dikin an na.”

Zêdeyî 12 salan di ser krîz û şerê navxwe yê Sûriyê re derbas bûn, tevî ku bi dehan kongre, forum û civîn di wan salan de li gor biryara navdewletî ya 2254ê bo çareserkirina wê krîzê hatine sazkirin, lê li girêka kor rawestiyaye, di demekê de ku niha Siûdiye mijûlî wê yekê ye 19ê Gulana bê Serokkomarê Sûriyê vexwîne Lûtkeya Komkara Erebî ku dê li Riyaza paytext bê sazkirin.

# Bi laş guherînkarî nayê kirin



N: Vênûs Fayq
W: Hesen Mukerem

Di gel wan hemû dengên bilindbûyî yên bo azadbûn û wekheviya jinan, herwisa ev hemû jinên ku xwendevaniyê diqetînin, û hundrî bazara kar dibin, çi mîna karmendên hikûmî, û çi wek kar û pêşeya serbixwe, ku hîn pirs dikin çima jin azad nine? Belkû pirs dikin çi demekê jin azad dibe? Hûnr bûn li rewşa jinan me digihîne ser vê baweriyê ku xwandin û xebatkirin tevaw ninin bo vê ku jin bi tevahî azad be û bi awayek dadperwerane digel zilam wekhev be.

Sîmon Do Bovuar di pirtûka “Zayenda din” de ku di sala 1946 a zaynî  li Parîsê bo yekem car çap kir, du pirsên binyadî dike, ku renge piştî derbasbûna 87 salan li weşana vê pirtûkê heman pirsê dubare bikin:

Ti tiştekê wiha kiriye ku rewşa jinê bigihîje vê yekê ku îro tê de ye, wate bibe zayenda din?

Duyem, ti tiştek sebeba vê yekê ye ku jin nekare bibe bi yek û bihevre bi yek dengî lihember vê heqîqeta zilaman bibin ku li ser wan de hatiye sepandin?

wan her du pirsan ger nezanî çi kesekê û li ti serdem û rewşekê de hatine kirin îhsas dikî di encama rewşa jinê ya îroyî de hatiye lîstin.

Di bingehê de hûrkirin û baskrina vê mijarê niha di vê serdemê de cuda ye, ger em di 50 salan beriya niha de bana.

Çimkî niha rewş aloztir e, 50 salan beriya niha bersiva piraniya wan pirsan ji jinê jê ra dihat dan ku çima azad nine û çima mafê wê hatiye xwarin, çima hatiye çewsandin?

Lê, niha ku pêka rewş û serdeman pênase tev hatine guherîn e, ku jin dibîne pênaseya şaş bi azadiya wê re tê dan.


Bo mînak: Wateya firerehend a azadiyê, di çûna ser kar û li derve derdas kirin û di ristûranê de nan xwarin û nêrgêle kêşan û car car jî xwarina elkolan de kurt kiriye, ev yeka jî çemka azadiyê di wateya felsefa xwe de vala kiriye.

Hin caran renge niha jî gelek çalakvanên warê maf û azadiyên jinê, baweriya wan wisa ye ku, hebûna dahat û aliyê aborî yekem stûna pişta jinê bin, bona bidestveanîna jiyaneke azad û kêrhatî, bitaybet bo wan jinên ku li hevjînên xwe cuda dibin û neçar nebin ku ji ber dabînkirina hewcehiyên jiyana xwe û zarokên xwe sivikatîkirina zilamekê qebûl bikin.

Lê, min baweriya tevaw heye ku ev yeka jî tevaw nine, jin tenê bi hebûna dahata aborî azad nabe, renge ji aliyê dabînkirina nan û hewcehiyên rojane êdî bi hebûna zilam tunebe, lê di civakên paremayî yên mîna civaka Kurdî de, hîn ev jina koleya kultûr û hişmendiya zilamsalariyê ye û wisa ye ku hemû pêngav û reftarek li ser wê tê hesabkirin.

Ger jin bi dîtingeheke dewlemend di asteke naskirina baş(me`irfe) nebe xwediyê dahata xwe, her bi nîva seqet a mafên xwe nagihîjê.

Ev yeka bi wateya vê ye ku jin bi kûrahî bawerî bi çemka aza-



diyê nebûye, weke çemkek mirovî ku jiyana tevahiya civakê rindtir dike û bi awayeke erênî bi pêşve dibe, ti carî azadiya tevaw dest nakeve.

Çimkî ti wateyek vê tuneye, ez di rû de pêşkevtî û modern derkevim, di demekê de ku jîngeha civaka derdora min bawerî bi vê azadiya min tunebe, belkû te nefret jî bikin.

Arîşeya herî zêde ya jinên çalakvan ev yeka ye ku tenê berevanî ji mafê jinan dikin, banghêjiyê bo civakeke bextewer nakin, bi baştir kirina jin û zilaman bi hevre. Nab e zayendek azad be û zayenda din di tarîtiyê de asê bibe, û bawerî bi ti yek ji azadiyên jinê tunebe.

Em di civakekê de dijîn ku bi komek yasa û şerî`etan birêve diçe, bi hişmendiyek, asay ye ku cem wî rojane jinek bê kuştin, bi dîmena jineke îşkencekirî, navecinqe, êdî jixwekirina kincên modern û xwe xemlandin û çûna ser kar û di ristûranan de nan xwarin û li dîlankirin di tîma dîlanan de û heta xwarina elkolan jî wateya hebûna azadiyê ninin, hebûna dahata taybet bi jinê wateya tevaw a zadiya jinê nagihîne.

Çimkî tu hîn di nav xeleka tarî de dizivirî ku jêra civak tê gotin. Guherîna vê civakê jî hewcehî bi mejiye ne laş.

# Sara Mukerem: “Rewatî tenê bi awayê mecazî nine, di pişta vê rewatiya Komara Îslamî de hebûneke aborî heye”



**Sara Mukerem**
**Çalakvana siyasî**

**Li derheq givaşên rejîmê bona sepandina hicaba zorê li ser Keç û Jinan li Îranê de, Me “Agirî” Hevpeyvîne di gel çalakvana siyasî Sara Mukerem pêk anî ku navbirî got: “Rewatî tenê bi awayê mecazî nine, di pişta vê rewatiya Komara Îslamî de hebûneke aborî heye”.**

**P: Bi nerîna we çima rejîma Îslamiya Îranê rewatiyê dide bi Besîc da ku hicaba bizorê li ser xelkê de bisepîne?**

**B:** Di destpêkê de dibe em wiha bas bikin, rewatî tenê bi awayê mecazî nine, di pişta vê rewatiya Komara Îslamî de hebûneke aborî heye, yanî hêza Besîc an hêzên serkutker yên din yên Komara Îslamî di ewlehiya welat de pir akitîvin û hewcehî bi mezaxteke zêde ya aborî hene, da ku bi vê hincetê serweta welat bo wan saziyan mezaxte bike hewl dide bi hemû awayî hem rewatiyê bide wan navendên xwe yên serkutker û hem dest bi ser serwta welat de bigire, bi taybet di wan demên dawiyê de ku mijara hicabê gelek bo Komara Îslamiya Îranê bûye mijarek sereke, Rejîma Îranê hicab weke qanûnek di zagonên xwe de weke madeyeke girîng destnîşan kiriye, ji bo ku Komara Îslamiya Îranê bikare bi sere civakê de zal be, bitaybet vê yekê ku jin di wan hêlên hikûmetê de dernekeve, rewatiya bê sînûr dide bi saziyên xwe yên weke Saziya Besîc û … hwd.

**P: Gelo çima Saziya Besîc daxwaz kiriye ku navendên din yên ewlehî û leşkerî yên rejîma Îranê di sepandina hicaba bizorê ya welatiyan de pişkdar bin?**

**B:** Em hemû dizanin ku hemû navendên leşkerî û ewlehî yên Komara Îslamî di serkutkirina welatiyan û binpêkirina mafê mirovî yên welatiyan de di heyama 40 çend salên temenê biyom yê desthilatdariyê de bitaybet di heyama serhildana şoreşa Jînayê de dest hebûne, û fermana xwe rasterast ji Xameneyî rêberê rejîmê werdigrin û di vê navberê de navê Saziya Besîc di nav civakên mafê mirov û Civaka Navneteweyî de pir berçav bûye û me dît ku her ji berê jî çend berpirsên vê saziyê rastî dorpêçên welatên Ewropî û Amerîkayê hatin û givaşên bê sînûr ser in, û her ji ber van givaşên li ser vê saziyê jî dixwaze hinek saziyên din bixe rojevê.

û ev yeka jî siyaseta xapnadinê ya desthilatdarên Îranê ye ku dixwazin wiha cinayetên siziya Besîc perdepoş bikin.

**P: Gelo hemû cîhan şahid bû ku çendîn navendên cuda yên hikûmetê di serhildana “Jin, Jiyan, Azadî” de bi awayê herî hovane xelkê azadîxwaz tepeser kirin, lê tevî vana jî Saziya Besîc ji Saziya FERACA yê daxwaz kiriye daku berpirsayetiya li derheq hicabê de pişkidar bibe?**

**B:** Saziya (Sehfa) an heman FERACA ye ku Berpirsê wê niha Muhsin Fetahî ye û ev hêza bi gotina hikûmetê di bin rêveberiya giştî de ye, lê ev jî her fermanê ji Elî Xamineyî rêberê rejîmê verdigire û di tepeserkirin û tundûtîjiya li ser welatiyan weke girtin, îşkencekirin û azardana welatiyan bitaybet jinan de dest hebûye û heye, lê herçawan ku min di bersiva pirsa pêş de bas kir, hemû navendên leşkerî û ewlehî yên Komara Îslamî di qetlkirin û îşkencekirin û girirtina welatiyan de û şerê pîskolojiya li ser malbatan de dest hebûne, lê navê Saziya Besîc û Spaha Pasdaran pir xuya bû û berpirsên wan rastî dorpêçên navnetewî hatin, û rejîm roj bi rojê ji aliyên welatên Ewropî û Civaka Navnteweyî ve rastî astengiyan hatiye û heta roja Çarşemî 23ê Sermaweza



1401an a Rojî, li civîna Saziya Neteweyên Yekbûyî de, bi 29 dengên erê, biryara derxistina Komara Îslamiya Îranê li Komîsyona Pêgeha Jinê, bi sedema tepeserkirina xwenîşanderên Îranê hat pejrandin û niha jî Komara Îslamî ji bo xwe derbaskirina ber bestên wiha yên Civaka Navnetewî, ji Saziya Sehfa (FERACA)yê dixwaze derkeve pêş.

**P: Gelo çima Îran ewqas li ser hicaba bizorê ya jinan tekezî dike?**

**B:** Ji aliyekê armanceke din a Komara Îslamî eve ku bi ferzkirina hicaba bi zorê li ser jinê, eva be ku hicabê ji xwe re weke sembol û modeleke jiyana Îslamiya modern û civakeke berevajiyê civaka li heqîqeta azadiya takkesî biafirîne û ev kesê ku li gorî vê jiyanê tevnegere weke dijberê vê rejîmê hesab dike.
Ji aliyek din ve jî, Komara Îslamiya Îranê tevî wan hemû berxwedan û tekoşîna ku di kolan, zîndanan de, gel ji xwe nîşan daye hîn jî naxwaze vê yekê bipejirîne ku şoreşek di nav dilê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê de pişkiviye û êdî nema gel û bitaybet jinên ku hertim rastî serkutkirin, destdirêjî û îşkenceyan û hicaba zorê hatine vê yekê qebûl nakin û herwisa Komara Îslamî baş dizane ger gel di mijara hicaba zorê de pêngaveke baş bihavêje, vê demê Komara Îslamî sengera xwe ya herî sereke ji dest dide, di wir de em dibînin ku Komara Îslamî di nav tirs û xûfeke mezin de ye, ji ber vê jî li ser hicaba zorê tekezî dike û di hemû qadan de hemû hêzên xwe yên serkutker seferber kiriye û herwisa Komara Îslamî vê jî baş dizane ger jin azad bibe dê di rêveberiya civak û welat de roleke girîng hebe ji berku jin xwediyê hêzeke birêvebirina civakeke demokratîk e, lewra Komara Îslamî bi hemû hewla xwe dixwaze bi hinceta hicabê, jinê sînûrdar bike da ku xwe keseke kêm di civakê de bizane.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Dêhgolan; Mamosta Arman Sadiqî bi cezayê girtîgehê, qamçiyan û qedexekirina jixwekirina cil û bergên melayan hat mehkûmkirin

Mamoste "Arman Sadiqî", pêşnimêjê Înê yê gundê "Hisênî" yê bajarê Dêhgolanê û rêveber û mamostayê Dar El _Ûlûma Mihemed Resûlullaha Dêhgolanê, ji aliyê dadgeha Taybet a Rûhaniyet a bajarê Hemedan ve, bi 7 meh û nîv girtîgeh, 74 qamçiyan û qedexiya ji xwekirina cil û bergên melayan hat mehkûmkirin.

Li gor çavkaniya haydar "Kurdpa", dadgehê ev mamostayê Olî yê Kurd bi "propagandaya li dijî nizamê" û "xerabkirina hizra giştî" tohmetbar kiriye û biryara derheq wî de hewcehe birê ve here.

Ev hikuma di çend rojên borî de ji mamoste "Arman Sadighî" re hatiye ragihandin.

Roja Sêşemî 8'ê Sermawez a 1401'an, Mamosta "Arman Sadiqî", pênimêjê gundê "Husênî" yê ser bi bajarê Dêhgolanê, li dadgeha Taybet a Rûhaniyeta bajarê Hemedanê hate toohmetbarkirin û bi barimteyê hatibû azadkirin.

Ev mamosteya Olî yê Kurd piştî piştgirî dana serhildana şoreşgerî ya "Jin, Jiyan, Azadî", bo dadgeha Taybet a Rûhaniyet a Hemedanê hate gazîkirin..

## Pîranşar; 3 welatiyên Kurd bi cezayê girtîgehê hatin mehkûmkirin

Sê welatiyên Kurd bi navên "Cemal Elîzade", "Hasil Qedû" û "Ebdulrehman Mihemedî Erşed" xelkê bajarê Pîranşarê, ji aliyê taya duyem a dadgeha Şoreş a Mehabadê bi serpereştiya dadwer "Acaqlû" bi cezayê girtîgehê hatin mehkûmkirin.

Li gorî biryarê, "Cemal Elîzade" bi tohmeta "hevkariya bi medyayên dijmin re" 30 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn, "Hasil Qedo" jî bi tohmeta "kombûn û lihevkirina ji bo kiryarên li dijî ewlehiya welat" 4 sal û 6 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn û "Ebdurehman Mihemedî Erşed" bi îdiaya "kom û komploya li dijî ewlehiya welat" 4 sal û 6 meh cezayê girtîgehê hate birîn.

Di rojên derbasbûyî de biryara dadgeha pileya yekem li ser van her sê welatiyên Kurd bi fermî ji wan re hatiye ragihandin.

Roja Yekşemî 23'ê Rêbendan a 1401'an, "Cemal Elîzade" bi danîna barimteya bi qasî 3 milyar Tûmenî heta dawiya dozê bi awayek demkî ji girtîgeha Nexedê hat azadkirin.

"Elîzade" ji bo lêpirsînê bo girtîgeha Îtla`ata Urmiyê hat veguhastin û piştî bidawîhatina proseya lêpirsînê bo girtîgeha Nexedê hat veguhastin.

Êvariya roja Sêşemî 26'ê Rezbera sala 1401'an, hêzên ewlekarî bi ser mala "Cemal Elîzade" de girtin û bêyî nîşandana belgeya dadgehê, ew binçav kirin.

Roja Pêncşemî 13`ê Rêbendana sala 1401`an, "Hasil Qedo û Ebdurrehman Mihemedî Erşed" her yek bi danîna barimteya bi qasî 3ê milyar Tûmenî ji girtîgeha Nexedê hatin azadkirin.

Ev 2 welatî bi tohmeta piştgirî û beşdariya di xwenîşandanên Pîranşarê de ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatibûn girtin û ji bo lêpirsînê bo girtîgeha ewlehiyê ya Urmiyê hatibûn veguhastin.

Ev her du welatî piştî lêpirsînê bo girtîgeha Nexedê hatine veguhastin.

## Keyvan Zendkerîmî piştî danîna barimteya bi qasî 3 milyar Tûmenî ji girtîgeha Sinê hat berdan

Roja Sêşemî 12'ê Banemerê, welatiyê bajarê Sinê Keyvan Zendkerîmî piştî 125 rojan binçavkirina demkî, bi danîna barimteya bi qasî 3 milyar Tûmenî heta dawîhatina dozê, ji girtîgeha Sinê hat berdan.

Ev welatiyê 29 salî di dema binçavkirinê de li mafê hebûna parêzer hatibû bê parkirin.

"Keyvan Zendkerîmî" li 7'ê Befranbara 1401'an, ji aliyê hêzên ewlehiyê ve li cihê karê xwe hatibû binçavkirin û piştî du mehan lêpirsînê, ji yek ji navendên ewlehiyê yên bajarê Sinê bo girtîgeha vî bajarî hatibû veguhastin.

Heta niha ti zanyariyên berfireh derbarê tohmetên vî welatiyê Kurd de bi dest neketine.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (445)


## Wêneyên semînara xwandekarên PDKÎ bi hilkefta salroja şehîdkirina şehîd Îsmaîl Şerîfzade







